

Cîhan Roj

ŞERMÊN RAGIRTÎ

- Şano -

Çapa dîjîtal
Sîrwan Hecî Berko
Malpera Amûdê
01/2002

www.amude.de

info@amude.de

Çapkirina vê şanoyê bêyî destûra
Cîhan Roj û malpera Amûdê qedexe ye.

KESÊN DÎ LÎSTİKÊ DE:

Alîşan: Her tişt ji nasnameya xwe di hêlek hiş de dewisandi ye. Bi zimanek biyan perwerde bûye. Gur î pirtûkan e. Wek rewşenbîr xwe li jiyane germ dike. Zavayê Bapîvan e.

Bikuj: Dikandar e.

Niştiro: Nanî di hevan de ye, li her cîyê bi herkesî re gotin dirêse, her teqlek li ciyek dixê, di nav serberedayî yê de carna gotin wek hedîs ji dev dertê... Bi dergîstî ye. Lawê Bapîvan e.

Bapîvan: Bavê Niştiro ye. Yekî ziktirîş e. Heftê salî ye.

Meyman: Hevala Alîşan e. Heta tu bê bedew e, nexweşeke di nav nivînan de ye.

Îskan: Yekî çil û pênc salî ye. Ji jiyane û hewaye Ewrûpa reng lê zere ye. Cîranê Niştiro ye.

Rojîn: Yeka bîst salî ye. Por hertim lê hunayî. Dibistana navîn qedandiye. Keça Bapîvan e.

Ajda: Yeka sî salî ye. Azev e. Baltûza Îskan e. Etegek dirêj li xwe kiri ye.

Keçik: Şanoger e.

(Hodeyek piçûk. Li erdê du cilên gelêrî. Li dûwarek etamînek bi teyrên sîmîr xemilandî. Li dûwarê dî gopala Bapîvan ku jê re ji Hec xelat hatiye daliqandiye. Alîşan li ser sewkî, berçavik li ber çavan. Pirtûk di dest de. Destek li ber rû çav li nivîsan digêrîne. Yekî bejn bilind û simbil reş e. Bejn zirav e. Gelek xûz e. Rû lê qurmiçî ye.

.Niştiro bi kêr hewl dide ku ji qalikê bistîyek bîhokê "fîtik" ek çêbike. Her carî ku kêr lê dide di inte. Ji intîna wî bal li Alîşan sar dibe...)

Alîşan: Ji xwe re di jiyane de li tiştên mezin bigire, ew çî ji te ve ye, wek zarokan tu bi darikê ketî yî... Min ewqas pirtûk anîn, ka bixwîne...

Niştiro *(Bi intîn re ken li rû bela dibe)*: Te ev bistî dîtiye, ev bistî ji bo Rêdar sêv e, porteqal e, pisqilêt e, şekirê nav qaxiz e, nanê firinê ye...

Alîşan: Rêdar kî ye?

Niştiro: *(Bi tinaz)* Ha! Niha dor hat pirtûka min, wey ênişte mala te û heftê û heft bavê te ava... Rêdar berxikek e, hertim bi kalîn e... Li vî gundî meleyan dev ji Quran, çîrokbêjan dev ji çîrok gotinê, dayikan dev ji lorîkan, keçan dev ji stranên dilan beredaye...

Alîşan: *(Pêşî di hiş de gotinên bi zimanê biyanî li kurdî werdigêrîne, hinek difikire hê diaxive)* Rêdar kî ye, ez binasim baş dibe...

Niştiro: Ew zarokek deh salî ye. Wextê bavê wî li çiyê çû rehmetê ew şeş salî bû. Her ku bavê xwe dipirsî diya wî jê re çîrok lêdikirin. Diya wî carê jê re gotiye, bavê te kulîlkek li ber zinar e. Bi şevê bi bê re deng bi xwe dixê. Şevê Rêdar bi dizî diçe ber zinar. Ba nîn e. Rêdar bilûra şivên bi bîr tîne. Ji bêrika xwe fîtik dertîne, lêdide daku kulîlk deng bi xwe bixe..! Piştî derengî radizê. Tê *(rutubet)* di axê de ... Sibehê heya ew gihandin nexweşxaneyê "menenjît" li serî da. Niha ji bo wî

dunya hew dengê fîtikê ye... Min ji wî re pênc heb amade kir...

Alîşan: Bi êş e, lê di şeran de tiştên wanî dibin, encamên şer ên pîsikolojîk, sosyolojîk... hene. Normal e...

Niştiro: Wey malava, çî pisqolojîk nîzanim çîlojîk, lawîk wek keleha derdan li vî gundî

dil li me peritand...

Alîşan: Belê, hun duygusal in...

Niştiro: Çiksal çiksaal... Heyra ka hinek serî li dîwar bide daku zîmanê me bibîr bîne...

Alîşan: *(Deng bilind dike)* Yanî, dilê we pir nerm e...

Niştiro: Ma em ne kevir in...

Alîşan: Rast e, ev demeke dirêj e ku rewşenbîr li vî welatî neman, hun jî mafdar in...

Niştiro: *(Piştî kenek vîzal vîzalî şiv wek çî dihejîne)* Rewşenbîrê me jî Rêdar e.

Ma wêneyên ez çêdikim kî dikane çêbike hê, min jî destpêkiriye ku ji hêkan tiştinan çêbikim...

Alîşan: Hêêk!

Niştiro: Belê hêk. *(Hewakî bang li xwişka xwe dike)* Roojîîn, ka selika hêkan ji kakê xwe re bîne..!

(Rojîn bi tevî selika hêkan dikeve hodeyê.)

Rojîn: Ka te rûn û quşxaneyê nexwest..!

Niştiro: *(dev li guhê wê bi pistepist)*: Bise keçê, gere îşev herkes ji kenan di xwe de bimîze.

Rojîn: Şerm e, dev ji henekên ne li rê berede.

Niştiro: Na lê ez hew çend meselokan dibêjim.

(Rojîn dertê. Niştiro radihêje îşlikê Alîşan ê reş bi dîwar ve dadiliqîne. Li ber selik rûdine. Her carî hêkek diavêje îşlik. Alîşan bi ecêbmayî hewl dide ku jê re bibe asteng.)

Niştiro: Ez ji selikek hêkan bihurîme, tu ji îşlikek xwe nabihurî, malava te ewqas kitêb xwendine; wê îşlikê te bête şuştin lê hêkên me ne ji tiştêk re dibin, ka tu mereq jî bi te re tune ye..!

(Alîşan ditingije lê ji neçarî rûdine, dest li ber rû dibe temaşevan)

(Niştiro bi hêka sisêyan re radibe ser piyan bi tilîkek zerika li ser îşlik diherike rê dide û diaxive): Ev sipîk wek riya bavê min e, binihêre hey diçe dev li bavê min fireh dibe, wê dîsa bibêje bes, dev ji her tiştî beredin, xwedê Çi gotiye wê wanî be... Haylo, ev jî çavên bûka te ne... niçç, serî dîsa lê diheje.... rehme, pîrka te tê bîra te, ev zerik dişibe rûyê wê... *(Made li Alîşan tirş dibe)*

(Derî vedibe. Îskan bi tevî baltûza xwe dikevin hundir. Îskan li jor Niştiro rûdine. Alîşan gelek bi hurmet Ajda pêşwazî dike.)

Niştiro: Able, çox exîlen dal mêwesiz qalir. *(Êt, bistiyê ku pir xar bû mêwe lê namîne)*

(Tîrqîn bi Ajda dikeve. Dû re bi kenek zirav li Alîşan dinihêre, bo ku dilê wî nemîne li ber dilê wî dide.)

Ajda: Alîşan abî kibar bir insandir... *(Kek Alîşan însanek kibar e.)*

Alîşan: *(Bi coş û bi hêvî bi dest Îskan digire û ber bi îşlik ve vedikişîne)* Bak, kendi ni Van Gogh zanediyor... *(Te dîtiye ji wî wetir ew Van Gogh e.)*

Îskan: Niştiro, tu ji dil î an na?

Niştiro: Qey min rêxa dunyayê bela kir, di televîzyonê de camêrek bi hêkan tiştên ecêb çêdikir, min jî sê hêk şikênandin....

PERDE....

(Di hodeyê de Meyman li ser sewkî di nav nivînan de ye. Rojîn û Ajda li ber serê wê rûniştine. Niştiro kevçiyên li sifreyê rast dike. Alîşan û Îskan wêneyên di pirtûkê de şîrove dikin. Bapîvan çixareya dipêçe datîne ber tasa şorbeşîr.)

Niştiro: Hey xwedê jê razî piştî tu ji sifreyê rabî pêçandina tûtînê deqeyek nakişîne...

Bapîvan: Ku niha bêjin dergîsa Niştiro waye li bendê ye tuyê wek gule ji vir bipekî..! *(Ken bi herkesî dikeve. Herkes li ser sifreyê li benda Alîşan e. Niştiro bi dengê bi hêrs bang lê dike. Wek bang li kevir bike..! Bi qehir radibe û ji hodeyê dertê. Meyman bi nêrînên bi gazin li Alîşan dinihêre. Alîşan wek ku lez bide xwe ku rûpel biqedîne... Qasî du deqeyên di di dev Niştiro de pirtûkek, di ber doxîna şal de çend pirtûk, parçeyek ji rojnameyê wek egal li stûpêçayî dikeve hundir. herkes bi seyr e.)*

Niştiro: Ênişte, tu melayek bi derewan çawa bi cezman dikeve bi bîra min tînî, ka bixwîne, ma tu dikanî nêrîn û xemên Meymanê jî bixwînî hêêê! Bes wî...

Bapîvan: Niştiro, dev li qederê negerîne..!

(Rojîn dest Meyman datîne ser sînga xwe û diaxive. Meyman jî bi pistepist gotinên kurdî li tirkî werdigerîne.)

Rojîn: Sibe û êvar ji bo Niştiro tune lê rast jî dibêje; we her yekî çiyayek daniye ser dilê me bavo, Alîşan ewqas kitêb dixwîne lê tu car dilê Meyman nexwendiyê, ka bê dizane niha tînek çawa di dilê vê rebenê de ye?

Alîşan: *(Xem wek bi coş rê dide)* Dilxweş im ku Rojîn ku li gund mezin bûye û evqa serbest diaxive lê min çî hewl dan jî tu guherîn di Meyman de çê nebû..!

Îskan: *(Piştgirî dide Alîşan)* Rojîn, li Ewrûpa hurmetek mezin em didin jinan, lê bûka te jî pir bi ser min de tê; ma ne ewqas jî..?

Rojîn: Tu çiya tune ku rê pênekeve, hun jî ji wan çiyên in ku îro rê bi we ketiye...

Na, ez ji zavayê xwe hez dikim lê hew pirtûk ji bo ku rebeniya xwe vebîşêre xwendiyê..!

Alîşan:(*Bi hêrs*)Ne ewqas jî,ka li wir bisekine...

Rojîn:Ev e,binihêre mar di dilê te de liviya...Ev rexne ji alî keçek bajariyan ve li te bihata kirin heya te bersiv bidayê tuyê çend caran wek hozor bihatayî badan...

Alîşan:Ku tu ewqas bi mereq î piştî mîvan çû em biaxivin...

Niştiro:Bi xwedê ênişte qet bi ciyek ve neajo;em niha qala xwî û xisletan dikin,tiştê veşarî tune..!

Rojîn:(Pê li bişkoka têlevîzyon dike)Wextê bernameya jinan e.

PERDE....

(Herkes li telvîzyonê dinihêre.Keçikek ku reqs dike bi reqsê re bi dengêk şewat diaxive.Keçik jî wek di têlevîzyonê de be xemiliye û diaxive.Keçikek deh û heşt sali ye.Por lê dirêj,çav reş e.Destek li ser pêsirê diaxive.)

"We hemî tirs û xofên xwe di vir de veşart...

Li ser sîng hun belengaz û zarok bûn...

Ku hun bifikiriyana ev der robarek e...

Îştar ne qehpetiya jinê ye...

Li Helebçe hewr wek xêlî avêtin ser min,xêlî jar dadipalî...

Axxx,Hewa...Lê Zîn çima li ser dilê we nabe roj...

Îşev bila şev bibe birûskek li we ...

Hun li tirîja wê serî daynin xewa şîrîn...

Bê şermên ragirtî,mêraniya Ehrîmen bi Beko re bişewitîn...

Ev sîng e,xemên we li ser bûne didanê mar;kîjan roj di kêliyan de diçe ava û dertê...

Li pêsirên min binihêrin û şerm bikin..."

PERDE..

(Cî dikanek pirtiyane. Bapîvan û Alîşan li hember maseya dikandar rûniştî ne. Dikandar bi şelafî diaxive û dev bi ken e. Cixare dirêjî wan dike. bapîvan radihêje li Alîşan nagire.)

Bikuj: (hewakî bang dike.) Xorto xorto, ka xêra xwe ji qehwê ji me ra çayek û du qehwe bibêje...

Bapîvan: Malava.

(Alîşan radibe li pirtî û cil û kincan dinihêre.)

Bikuj: Bi xwedê tu xêr nemaye di vî îşê da, em ji xwe ra pê xwe dixapînin.

Bapîvan: Xwedê bi wî û bi zariyên wî ra be, niha li Îstanbul du mixaze vekrine...

Alîşan: *(Ji xezûrê xwe re)* Xalo, de ka mêzeke tu çî dikirî bikire...

Bapîvan: Îcab nake... ma perê te heye yan an?

Alîşan: Ka rabe.

(Bapîvan sakoyek dibijêre.)

Alîşan: Buha?

Bikuj: *(Ji ber ku ji heman sako firotiyê cîranê Bapîvan neçar dimîne ku heman buhayê bibêje.)* Êêê wele tu zanî... xatirê Alîşan ... niha ya rastî min doho heman sako firot cîranê te bi çil û pênc mîlyon lîreyî, de îja ew bi deynê "doqizincî ay" *(meha nehemîn)* bû. Alîşan mêvan e, bila ji we ra bi sî û pêncn be...

(Alîşan bê hemd li fîtik dide.)

Alîşan: Beriya bi deh rojan ev sako li îstanbûl bi Çar mîlyonî bû..

Bikuj: Wî , ma tu jî dizanî her mal ne yek e!

Alîşan: Her mal ne yek e....

Bikuj: Her mal ne yek e...

Bapîvan: Her mal ne yek e...

(Li derketinê.)

Alîşan:Rojîn rast dibêje pirtûka ku pel lê dirizin vaye li ber destê me...

PERDE...

(Rojîn, Meyman, Ajda di hodeyê de ne.)

Ajda (*Eslê gotinan bi tirkî ye*): Hun dizanin, hezkiriyê min bi leşkerî hat vî welatî û hat kuştin. Hêsir ji çavên Rojîn de diherikin. Ajda bi matmayî)

Ajda: Çi bû bi te?

Rojîn: Te çiqas jê hez dikir?

Ajda: Bi qasî dunyayê?

Rojîn: Ew hew dildarê te bû...

Ajda: îhtimal bû ku em bizewiciyana...

Rojîn: Ka li tilîka min mêze bike...

Ajda: Nameya dawî hê va bi min re. (*nameyê ji bêrika çante dertîne û dide Rojîn*)

Ka bixwîne. tew hevoka dawî ... "Berxam" gotiye, "ez diçim lê nizamim wê riya min bi kîjan dunyayê dikeve...."

Rojîn: (*Ji paşila xwe wênayek dertîne û rê wê dide...*) Tu tiştê me ê nivîsî tune ye,

li ku însan bizanibe bixwîne ev e çavên wî, li palek sipî çîl, bi simbilê qeşayî her tiştî dibêje...

Meyman: (*Bi girî*) Ê we herduyan jî hêvî û tînek heye, lê ê min... Bê Per û bask li min şikand...

Rojîn: Êt, hun dixwazim mêrê we wek mêr be, lê ew wek zarok in, dixwazin hun hinek jî ji wan re dayiktî bikin, tu car bi navê mêraniyê bavê wan nehişt dayika wan ji wan re dayiktî bikin... Waxtê bi we re radizên ew hêrs û hovtî ji kerba tolhildanê ye...

Ajda: (*Bi hurmet û ecêbmayî*) Te dibistan xwendî ye?

Rojîn: Belê, bê pênûs û kaxiz, li ser pelên hişk û li ber kevirên hineyî, ew gotin jî ên mamostaya min in...

Ajda: Rojîn, hew min bizanibûya dildarê min bi çi awayî hate kuştin..?

Rojîn: Ku ez û tu bikanibin hevudu bidin jiyandin wê tu bizanibî ew ne çawa lê ji bo çi minr..!

(Alîşan dikeve hundir. Li ser piyan li Meyman dinihêre...)

(Niştiro di dest de selika hêkan dikeve hundir... Alîşan dev bi ken lê dinihêre)

Niştiro: Na birawo na, bi xwedê ezê niha ji te ra serê çend hêkan lihev bixim...

PERDE...

Cîhan Roj

Gimgimî ye. Di sala 1993'an de dest bi nivîsandina bi kurdî kir.

Di "WELAT, WELATÊ ME, AZADIYA WELAT, JIYANA REWŞEN, MEHNAME, NIVÎS ..." de çîrok, helbest û gotarên wî hatine weşandin. Ji bo ko ji zimanzan re bibe alîkarî carna di derbarê ziman de jî nivîsî.

Di kovara MEHNAME de romanek bi navê "Biryana", dosêyek çîrokan bi navê "Şîlana kal", du dosyên helbestê bi navê "SÎSAR" û "PÊNÛSA TER" hatin weşandin.

Hê di rojnameya ROJEV de di quncikê bi navê KANÎSARK de ji hefteyê carê gotarek dinivîse. Beriya navê Cîhan Roj bi bernavkê **Jêhat Gimgim** dinivîsî.



Wêne: Rojev